**NORDKURDISKA**
**KURDÎ/KURMANCÎ**

# SWÊDÊ MODERNÎZE BIKE

## MANÎFESTOYA HILBIJARTINÊ YA PARTIYA JÎNGEHÊ – PÊŞEROJ LI VÊDERÊ YE

Manîfestoya Partiya Jîngehê ya Keskan – hilbijartina 2010. Ji bona guhertineke kesk ku karên nû peyde dike, siyaseteke îklîmî ya pêwîst û piştgirîyeke cîhanî.

miljöpartiet de gröna

# PÊŞEROJ LI VÊDERÊ YE

Hilbijartinên ku em niha dikin, şikil didin jiyana me ya di pêşerojê de. Ew xebat û keftelefta ku em îro dikin, ji bo avakirina civata rojên li pêş me ye. Ji bona peydekirina pêşveçûnek ragirbar zanyariyên me hene. Divê anuha û li vêderê guhartin çêbibin.

Partiya Jîngehê bi siyasetekê diçe hilbijartinan, ji bona ku guhertineke kesk di temamê civatê de çê bibe ku karên nuh peyda bibin, ewleyî zêde bibe û Swêd bi hêztir bibe. Em dixwazin civateke saxlem û demdirêj ku bikaribe pêşwazî li reqabetên pîşerojê bike, ava bikin.

Partiya Jîngehê dixwaze xebateke mezin ji bona guhertineke kesk di hemû aliyên civatê de bibe, bibîne. Green New Deal-ek. Em dixwazin ji her mirovî re hêsantir bikin ku bikaribe di jiyana xwe ya rojane de hilbijartinên ragîrbar bike. Riyên hesin, enerjî bi riyên nuh, tramvay, riyên piskilêta û bajarên enerjîzîrek pêşeroj in. Em kesk dixwazin çi liser razandinên pêwîst hebin bikin. Ew ne tenê qezenc in -kar û şixul jî zêdetir dikin.

Em dixwazin Swêd nûjen bikin. Ji me re di warê perwerde, lêkolîn, xwedîşîrketbûn û mitehidîtiyê de liser razandin lazim in. Divê ji bona ku mirov bikaribin fikrên xwe pêk bînin û cesaret bikin ku gavên xwe ji kar bavêjine xwedî şîrketbûnê ji wan re hêsantir bibe.

Em dixwazin ji civata bikir -û bavêj xilas bibin. Divê ku di tamîrkirina tiştekî xerabe de qezenc hebe. Em dixwazin baca bikaranînê(momsê) ya ku li ser kar û xizmetê ye kêm bikin, ji bona ku mirov ji bo serfkariyeke li gor jîngehê bên teşwîq kirin û di eynî wextî de kar û şixulên nuh bên peydekirin. Bi xebat û liser razandinan di sektora giştî de û li ser refahê(têrûtijebûnê) jî, ji gelek mirovan re kar tê peydekirin.

Em kesk lihevkirî ji bona xwezayê amade ne, dema ku xweza ji ber berjewendiyên demkurt dikeve ber xeterê. Hewesa me ya ji bo xwezayê ji evîndariya me ya ji bo xwezayê tê, piştgirîxwaziya me ji bona mirovên ku îro dijîn û ji bona nifşên ku wê bên, tê. Armanca siyaseta me cîhaneke piştgirîxwaz e. Ji loma em ji bona aşîtîyê, mafê mirovan û çek kêmkirinek cîhanî(global) kar dikin.

Siyaseta me azadîxwaz e. Em dixwazin civateke wekhev ku cûdahiyê naxe nav mirovan de ava bikin. Eva ji bona me pirseke azadiyê ya bingehîn e. Civat dewlemendtir û dînamîktir dibe, dema ku em cûdahiyên di cûdatiyênbingehîn û cûreyên jiyanê de qebûl dikin. Divê mirov şansên jiyanê yên nuh bide mirovan. Divê sîstemên ewleyîyê bên tamîr kirin û ji bona herkesî bin.

Partiya Jîngehê ya Keskan bi partiyên din yên tevkarê xwe re diçe hilbijartinan ji bona ku paş hilbijartinên parlemanê yên sala 2010-an hikûmeteke sorkesk ava bikin.

# JI BONA KÊMKIRINA BANDORÊ LI SER AVÛHEWAYÊ Û PEYDEKIRINA KARÊN NUH XEBAT BIKE

### 1. DIVÊ SWÊD PARA XWE YA BERPIRSIYARIYÊ BIGRE SER XWE

Divê Swêd berpirsiyariya xwe ya global bigre ser xwe. Divê berdana bermayîyên gazê ku bandorê li ser hewayê dikin li gora tewsiyeyên lêkolîneran bên kêmkirin. Wê zêdekirina bacên jîngehê bikaranîna sûtemeniyên fosîl bihatir bike.

## 2. KAPASÎTEYA TORA RIYÊN HESIN DUQAT BIKE

Ji bona siyaseteke trafîkê ku ji îklîmê re baş, li seranserî welêt liser razandinên mezin ji bo riyên tirênan pêwîst in. Divê kapasîteya trafîka rêwiyan û ya bar -û tiştan duqat zêde bibe. Em dixwazin riyên hesin yên ji bo suraetên bilind çê bikin û bajarên Swêd yên wek Stockholm, Goteborg û Malmö bi Kopenghag û Oslo ve girêbidin. Em dixwazin riyên hesinî yên herêmî jî bi ya sereke ve bên girêdan, ji bona ku peywendiyên herêmî bihêztir bibin. Divê swarbûna tirênê ji ya bi turumbêl û teyareyan erzantir bibe.

## 3. TRAFÎKA KOLLEKTÎF FIREHTIR BIKIN

Ji bona ku zêdetir bajarên ji îklîmêrezîrek bên avakirin em dixwazin xebateke xurt ji bo firehkirina trafîka kollektif bikin. Wek tramvayê, tirênên herêmî, metroyê û otobosan. Em dixwazin hetanî sala 2020-an para trafîka kollektîf duqat bikin. Tu pêwîstî bi çêkirina otobanên nuh tuneye. Divê transportên kollektîf ji bona kesên kêmendam gehîştbar û bisûd bin.

## 4. SÛTEMENIYÊN NUH JI BONA TURUMBÊLAN

Li Swêd gelek kes bi hewceyî turumbêla ne. Sûtemeniyên fosîl hem ji bo jîngehê û hem jî ji ber mesrefê divê bên guhartin. Ji loma divê mecal bê dayîn ku herkes bikaribe turumbêla xwe bi sûtemeniyên nuhderketî dagrin. Divê turumbêl ajotina bi sûtemeniyên nuhderketî ji ya bi benzînê erzantir be. Divê ji bo çêkirin û belavkirina sûtemeniyên nuhderketî ku li hundur welêt tên çêkirin alîkarî bê kirin. Divê mirov bikaribe li herderî welêt turumbêla xwe bi biogazê tije bike û bikaribe turumbêla xwe ya bi elatirîkê jî bi elatirîkê dagire.

## 5. ELATIRÎKA XWE BIXWE ÇÊBIK

Em dixwazin ku mirov bikaribe elatirîka xwe bixwe çê bike û qezenc têde hebe. Gelek mirov dixwazin li ser enerjiya nuhderketî xebat bikin û tesîra ku ew bixwe li îklîmê dikin kêm bikin. Eva tê maneya ku wê gelek kes karibin elatirîka nuhderketî çêbikin û bişînin xeta elatirîkê. Em dixwazin sîstemek fiyet ya sabît li ser elatirîka nuhderketî deynin û mecalê pîvandineke net bidin kesên ku elatirîka hindik çê dikin.

## 6. JI BONA ENERJÎYA NUHDERKETÎ Û BITESÎRKIRINA ENERJÎYÊ XEBAT BIKE

Em dixwazin hêza nukleer û sûtemenîyên fosîl bi hêza ba, sûtemenîya biyolojîk, hêza pêla, enerjîya rojê û efektîfkirina enerjîyê biguherin. Em dixwazin ji bona jinûhve avakirinên ku xerckirina enerjîyê kêm dike, xebatê bikin. Wilo mesrefa enerjîyê jî kêm dibe. Divê derxistina uranyûm bê qedexekirin.

## 7. BI RÊKÛPÊK KIRINA MILYON PROGRAMAN

Em dixwazin alîkariyek taybet ji bona çêkirina xanîyên nuh, tamîrkirina yên kevn, navenda mihelleyan û berî her tiştî ji bona derûdora bajaran dest pê bikin. Ev hewildan wê cîhên lêmayînê xweş bikin û bikaranîna enerjîyê kêmtir bikin.¨

## 8. ZÊDETIR BAR BI TIRÊN Û KEŞTÎYAN

Ji bona ku ewleyîya tirafîkê li riyên me zêde bibe û berdana bermayîyên gazê kêm bibe, em dixwazin bacekê li ser kemyonê bara deynin. Ewê bike ku şandina bar û tiştan bi tirên û keştîyan ji ya bi kemyonan erzantir bibe.

## 9. TEBÎET Û PIRCÛREYÎYA BÎYOLOJÎK PARASTIN

Divê mêrg û çêreyên me yên ku bi cinsên tebîetê dewlemend bên parastin û parastina qiraxên behr û golan bê xurtkirin. Divê Swêd cinsê herçar heywanên dirinde yên mezin demdirêj bihewîne. Wek gur, wîşk, hirç û jerv. Divê belavbûna jehrên jîngehê bên kêmkirin, mesela wek dermanên bromkirî û yên ku hormonan bêhizûr dikin. Em dixwazin erdên xwe yên şil biparêzin û yên ku zuha bûne ji nû ve şil bikin û bi qanûnê ava bin erdê ku ji bona xwedkirina me girîng e biparêzin.

## 10. ÇANDINÎ BI RÊZGIRTIN JI HEYWANAN RE

Divê dermanên li dijî ziyandaran û ziblê febrîqeyan pir kêm bê bikaranîn. Parastina heywên divê bê xurtkirin û em dixwazin çêkirina kurkên çerm bê qedexekirin. Divê ax û xwelîya qenc bê parastin. Em dixwazin zîreeta ekolojîk bibe bi fêde. Divê Swêd di adanên kesk de, wek ekotûrîzm, çandinî û baştirkirina bihindikayî çandina tiştên xwarinê de li pêş welatên din be. Em dixwazin axê ji mehsûlên ku bi manîpulasyonên genetîk in biparêzin.

# KARÊN NUH, MITEHIDÎ Û ŞÎRKETÊN BIÇÛK

### 11. BACA BIKARANÎNÊ JI ŞIRKETÊN XIZMETÊ RE KÊMKIRIN

Bi kêmkirina baca bikaranînê ji bo gelek sektoran em dixwazin ku sektora xizmetê mezin bibe. Wê çaxê tamîrkirina tiştên xerabe, li loqenteyan xwarin, çûna ser berber û piskilêt tamîr kirin erzantir dibe. Divê serfkirinek ragîrbar ya xizmetan bê teşwîqkirin û em dixwazin di vê dewra wezîfedarbûna hikûmetê de gava ewil bavêjin.

### 12. BACA KÊM JI BO ŞÎRKETÊN BIÇÛK

Em dixwazin baca kardêriyê ji bo şîrketên biçûk ji sedî deh kêm bikin. Em dixwazin baca şîrketên ku bi tenê kesek tê de kar dike ji bona salekê hîn jî kêmtir bikin gava ku şîrket kar bide kesekî din jî.

### 13. SERMAYA BI RÎSK JI BONA ŞÎRKETÊN BIÇÛK Û NAVENGÎ

Em dixwazin ji bona şîrketên biçûk û navengî fondek dewletê çêbikin ku ew bikaribin ji xwe re sermaye peyde bikin. Divê fond bi pereyên ku ji fêdeya şîrketên dewletê tên fînanse bibe.

### 14. ENDUSTRÎ Û BAZIRGANÎ LI QIRAXA PÊŞ

Gelek mitehidên nû wek kêşehêz zêdetir berpirsiyariyên etîkî, sosyal û jîngehî digrin ser  xwe. Ev jî alîkarîya pêşveçûneke ragîrbar dike. Divê piştgîrî li helwestên wilo bê kirin. Em dixwazin alîkariya peran ji şîrketên biçûk û navencî re, ji bona fikrên nû, zêdekirina berheman û pêşdebirina teknîka jîngehê zêde bikin. Divê şîrketên dewletê û yên şaredariyan ji bona teknîka jîngehê û enerjîyên nûderketî alîkarî bikin û di kêmkirina xwe ya tesîra li ser îklîmê de bibin nimûne. Divê xwedîşîrketbûna civakî û koperatîfî bibe perçeyek ji siyaseta kesk ya kardêran. Em ji bona ku şîrket zêdetir li gundan bicîh bibin kar dikin. Em dixwazin ji bona ku di karwergirtinên giştî de îmkanan bikarbînin û bikin ku baştir berpirsiyariyên sosyal, etîkî û jîngehî li ber çavan bên girtin, aktîv kar bikin.

### 15. KAR Û XWENDIN JI XORTAN RE

Em dixwazin di sektora refahê de programekî trainee dest pê bike. Divê ji bona xwendinên meslekî û cîhên wergirtina şagirtan jî xebat bê zêdekirin. Divê xwendegehên bilind wek beşek ji programa xwendinê zêdetir cîhên pratîkê di şîrketan de û li cem meqamên resmî pêşkêş bikin.

### 16. JIYANEK ÇANDÎ YA VEKIRÎ Û BERFIREH

Jiyanek çandî, afirandêr û zindî hem ji bo tendurustiyê û hem jî ji bo kalîteya jîyanê û pêşdeçûna civatê faktorekî biserketinê ye. Em dixwazin çandê bipêşde bibin ji bona ku mecal bidin herkesî û bi taybetî zarok û xort têkevin nav çalakîyên cûrbecûr yên çandî, hem wek bîner û hem jî wek birêvebir. Divê dibistanên çandê bên bihêz kirin. Çand  li beramberî serfkarîya materyalî alternatîfeke îklîmzîrek e.

# KALÎTEYA REFAHÊ ZÊDE BIKE, SERMAYE JI BI PERWERDEYÊ TERXAN BIKE

## 17. DIVÊ KESEKÎ BÊ SÎGORTE TUNEBE

Divê herkes têkeve ber sîgorteyên nexweşiyê yên ewle û modern. Em dixwazin heta ku mirov nexweş be ew bikaribe pereyên nexweşiyê bistîne û divê sînorê dawî ji bo sîgorteya nexweşiyê bê rakirin. Berpirsiyariya civatê ji bona rehabîlîtasyonek bitesîr, bi taybetî girîng e. Divê sîgorteyek bêkariyê ji bo herkesî hebe.

## 18. DEMA KAR KÊMTIR BIBE

Em dixwazin dema kar bikin heftiyê 35 saet, ji bo ku wextê mirov zêdetir hebe û kalîteya jiyanê baştir bibe. Wek gaveke ewil em dixwazin piştgirîyekê ji bona dêûbavên zarokên biçûk bînin da ku wextê wan yê li kar kêm bibe, û sala serbest carek din bê dayîn. Em dixwazin rê ji bona ku emrê teqawîtiyê zêdetir guherbar be vekin û mecalên baş ji bo kêmkirina dema kar di nêzîkî teqawîtîyê de peyde bikin.

## 19. PIRCÛREYÎ DI DIBISTANÊ DE

Mafê zarokan heye ku hacetên ku wê paşê di jiyanê de ji wan re lazim bibin, ji dibistanê bi xwe re bibin. Divê mecalên baş ji bo dêûbav û zarokan re hebin da ku bikaribin tesîrê li ser perwerdeyê bikin û karibin pedagojîyeke baş li gor zaroka xwe hilbijêrin. Divê hemû zarok li dibistan û pêşdibistanê bên dîtin û wextê wan bi mezinan re hebe. Ji loma divê kalîteye pêşdibistan û dibistanê bingehîn yên Swêdê baştir bibe. Lazim e em hejmara mamosteyan zêdetir bikin, grûbên zarokan biçûktir bikin û katê perwerdeya bi şema zêdetir bikin. Em dixwazin pircûreyîya dibistanan, pedagojîyê û îstiqametên perwerdeyê biparêzin. Em dixwazin demokrasîya şagirtan xurttir bikin û lênêrîna tendurustiyê ya şagirtan baştir bikin.

## 20. BIHÊLE ZAROK ZAROK BIN

Zaroktiyek ewle û bi lîstikan dagirtî divyabû mafê her mirovî bûya. Civatek ku ji zarokan re baş be, ji herkesî re baş e. Em dixwazin mafê zarokan xurttir bikin û peymana mafê zarokan têxin qanûna Swêd.

## 21. LÊNÊRÎNA JI BO PÊŞÎLÊGIRTINÊ

Cûreyên kar yên ku ji bo parastin û alîkariya tendurustiyê ye gerek tesîr li hemû lênêrîn û guhpêdanan bikira. Divê lênêrîn wekhev be, wekhevî tê de hebe û nêzîkî hemwelatiyan be. Kar weke tîm bê kirin, jîrbûneke fireh ya tibbî û psîkososyal tê de hebe. Ji bona ku nerihetiyên psîkolojîk bên kêmkirin û lênêrîna salmezinên me baştir bibe, terxankirina sermayeyeke taybet pêwîst e. Ji bona bi xeletî bikaranîna dermanan kêmtir bibe, divê kontrola li ser dermên zêdetir bibe.

## 22. XWARINA XWEŞ

Ji bona ku xwarin li dibistan, cîhê lênêrîna kalûpîran û nexwşxaneyan baştir bibe, em dixwazin kalîteya wê bilind bikin. Divê em li şûna xwarina kevn û li deverên dûr hatiye çêkirin û li dibistanê tê germkirin, xwarina ku li midbexên herêmî û li dibistanan nuhçêkirî bidin zarok, salmezin û nexweşan. Ji bona ku mirov daxwaz bike ku xwarin ji madeyên ekolojîk û herêmî bê çêkirin, divê qanûn bê guhertin da ku katê mafê xwarin çêkirinê bi deman tê firotin mirov bikaribe daxwaza xwarina ji madeyên herêmî çêdibe bike. Xwarina xweş û adanxurt beşek xwezayî ji yên têrûtijîbûnê ye.

## 23. XWENDEGEH BÊ XURTKIRIN Û DIRAVÊ XWENDINÊ ZÊDETIR BIBE

Di civatek bi zanyarî û modern de mercîya perwerdeyê navendî ye. Di xwendegehên bilind de, kalîte bilindkirin divê bi zêdekirina saetên bi mamoste çê bibe û zêdetir fokus bidin ser pedagojîyek baş. Em dixwazin mecalên nuh yên jiyanê bidin hemû mirovan û hêsantir bikin ku bikaribin di her dema jiyanê de bixwînin. Ji loma em dixwazin alîkariya ji bo xwendinê zêdetir bikin û tora parastina civakî ya xwendevanan baştir bikin. Tevkariya di nav zanîngeh/xwendegeha bilind û endustrî û bazirganiyê de xurttir bibe.

# CIVAKEK WEKHEV AZADIYÊ ZÊDETIR DIKE

## 24. WEKHEVÎ DI MALBAT Û BIRÊVEBIRIYÊ DE

Mafê dê û bav herdûyan heye ku li mal li cem zarokên xwe bimînin û mafê zarokê jî heye ku li cem herdûyan be. Em dixwazin ku sîgorteya dêûbavitîyê bibe sê beş, heryek ji wan beşekî bigre û beşê sisyan jî li gor xwestina xwe lihev par bikin. Eva mecalên wekheviya dêûbavan zêdetir dike. Ji bona wekheviya di nav birêvebiriya şîrketên borsayê û şîrketên giştî de em dixwazin qanûnekê derxin.

## 25. ARAMÎYA JINÊ AZADÎ YE

Ji bona aramîya jinê em dixwazin îmkanên Nobedariyên Jina(Kvinnojouren) zêdetir bikin. Pêşwazîya sîstema edaletê divê bi zanistî û îhtîram be. Ji bo entegrîteya şexsî, divê qanûnên di derheqa tecawizê de dijwartir bibin. Divê zarokên ku di malê de lêdanê dibînin wek gorîyên(qurbanên) sûc bên dîtin. Kesên ku ji bo lêdanê tên cezekirin divê mecbûrî tedawiyê bên kirin. Divê zora li ser mêran û zora di nav kesên ku ji eynî cinsî ne û bihevre dijîn jî bê ferqkirin. Ji bona ku rê liber qehbîtî û ticareta mirovan bê girtin zêdetir deramet pêwîst e.

## 26. WEKHEVÎYA MAFAN JI BO HERKESÎ

Divê qanûna li dijî dîskrîmînasyonê bê dijwarkirin. Em dixwazin ji bo wekhevîya nava şîrket û meqaman alîkar bin. Divê buroyên herêmî yên li dijî dîskrîmînasyonê bên xurtkirin. Em dixwazin berdewam ji bona mafên mirovên-HBT kar bikin. Divê karê li dijî tawanên nefretê bê xurtkirin. Divê mecalê hemû mirovan ji bo beşdariyeke tam hebe. Em dixwazin ku negihîştbarî, di qanûnê de, weke dîskrîmînekirina kesên kêmendam bê sinifandin.

## 27. FÊRBÛN BI ZIMANÊ DAYIKÊ

Yek ji awayên herî efektîf ji bo encamê xwendinek baş dema ku zimanê zarokê yê dayikê ne swêdî be ewe ku mirov fêrbûna zimanê dayikê bipêşde bibe. Em dixwazin mafê fêrbîna zimanê dayikê firehtir bikin ku di hemû salên dibistana bingehîn de bê xwendin. Em dixwazin xwendina dersan jî bi zimanê dayikê zêdetir bibe.

## 28. KAR Û PERWERDE JI BO KESÊN NÛHATÎ

Divê mirovên ku nuh tên karibin zûtir fêrî swêdî bibin, xwendina xwe biqulpînin yan jî li vir ser temam bikin û kar bigrin. Em dixwazin xwendina zimanê swêdî û pratîk bihevre bê kirin. Em dixwazin kalîteya dersa zimanê swêdî wek zimanê duwem, bilind bikin. Em dixwazin ku zanîngeh û xwendegehên bilind kursên zimanê swêdî pêşkêşî kesên ku xwendina akademîk kirine û tên swêd bike.

## 29. MAFÊ JIYANEKE ŞEXSÎ BIPARÊZ

Di nav civatê de mafê mirovan yê ji bo jiyaneke şexsî tê sînorkirin. Em dixwazin qaîdeyên ku ji bo destûrdana çavdêriyabikamerayê dijwar bikin ku bi taybetî rêz li mafê entegrîteya şexsî bê girtin. Divê dewlet nikaribe hemû tirafîka di nav kesên ku înternetê bikar tînin de qeyd bike. Em dixwazin ku qanûna -FRA nemîne.

## 30. ÎNTERNETEKE SERBEST Û MAFÊ ÇAPÊ YÊ EYARKIRÎ

Em dixwazin bi guhertina qanûna -IPRED garantîya hiqûqî û entegrîteya di înternetê de biparêzin. Em dixwazin mafê çap û kopye kirinê modernîze bikin û bikin ku ji înternet daxistina filîm û muzîkê ji bona bikaranîna şexsî ne tawan be. Bêalîbûna di înternetê de prensîbek girînge ku divê bê parastin.

# CÎHANEK RAGÎRBAR Û LI SER HEQÎYÊ MIMKUN E

### 31. SIYASETEK ÎKLÎMÎ YA ÇALAK Û CÎHANÎ

Divê berdana bermayîyên gazê yên global ku tesîrê li îklîmê dikin bên kêmkirin. Em dixwazin global kar bikin ji bona ku hemû alîkariyên aborî ku dewlet ji bona komir, neft û hêza nukleer dide, nemînin. Em dixwazin xercê jîngehê ji bona sûtemenîyên fosîl ji çûnûhatina teyare û keştîyên navnetewî bistînin û bidin bi berlêgirtinên ji bo jîngehê li welatên feqîr. Divê alîkariyên navnetewî ku ji bo tedbîrên îklîmê didin welatên paşdemayî bê zêdekirin.

### 32. LI DIJÎ FEQÎRTÎYÊ BIXEBIT

Em dixwazin ji bo ticaretek adil ku baştir li pêwîstiyên welatên feqîr miqate be, kar bikin. Asta alîkariya ku swêd dide welatê feqîr, divê bi kêmanî ji sedî yekê BNI be(Hatina Netewî ya Nesafî -HNN). Divê swêd li dijî ku welatên feqîr têkevin xefika deynan û ji bo ku deynê wan yên nemeşrû bên kêmkirin kar bike. Divê têkoşîna li dijî feqîrtiyê di siyaseta derve de, di ticaret û yarmetîya derve de bibe navend.

### 33. DAWÎ LI FIROTINA ÇEKAN BÎNIN

Em dixwazin dawî li firotina çekan bînin. Gava ewil divê mirov qaîdeyên firotina çekên swêdî dijwar bike. Nayê qebûlkirin ku çekên Swêd ji welatên ku mafê mirovan binpê dikin re bê export kirin. Em ji teyareyek-Jas ya nuhkirî ku gelek milyar lê diçin re dibêjin Na. Divê Swêd li derveyî Nato bimîne. Divê hewildanên ji bo aşîtî li cîhanê çê bibe zêdetir bibin. Ji bilî vê, em dixwazin ku çêkirina mayin û bombeyên kluster li Swêd bên qedexekirin.

### 34. TALANKIRINA MASÎYAN DI DERYAYÊN ME DE BÊ RAWESTANDIN

Hemû alîkariyên aborî ku fêdeyê li masîgirtinê dikin divê bên rakirin. Divê masîyê morîna û cûreyîn din yên masîyê ku di behrên me de hene bên parastin, heger hejmara cinsê wan di bin asteke ewle de bin. Divê li dijî masîgirtina bi qaçaxî tedbîrên bihêz bên girtin. Ji bona masîgirtina bi dizî di behrên din yên li cîhanê de jî kêm bibin, divê ku em sîyaseta Swêd ya ticaretê di bin çav re derbaskin.

### 35. DI SIYASETA PENABERAN DE RÊZGIRTIN JI BO MAFÊ MIROVAN.

Em dixwazin ku ji bo mihacir bi riyên qanûnî bên Yekîtiya Ewrûpa zêdetir rê hebin. Siyaseteke penabiran ku zêdetir insanî be lazim e. Ji zû ve kêmasî di siyaseta penaberan ya Swêd de hene, ji bo vê em dixwazin efûyekê ji bona kesên ku kaxetê wan tunene derxînin. Tiştê ji zarokê re baş, divê di hemû nirxandinê li ser penaberiyê de li helî pêş bê danîn. Divê kesên ku kaxetên wan tunebin jî mafê wan yê lênêrîn û çûna dibistanê hebe.

### 36. NA JI EMU RE

Em dixwazin ku Swêd pereyên xwe biparêze û nekeve EMU de(Yekîtiya Pereyan ya Ewrûpa-YPE). Divê EU (Yekîtiya Ewrûpa) zêdetir demoqeatîk be û kêmtir centralî be. Divê bergirîya EU ne miştêrek be.

# DI 19 ÎLONÊ DE DENGÊ XWE BIDE SWÊDEKE KESK, MIROVÎ Û MODERN.

**Di malpera www.mp.se de zêdetir bixwîne**

Bi riya sms bibe endam.
Nivîsa ”mpmedl ååååmmddxxx”
bişîne hejmara telefona 72456.
Mesref 50:- + heqê telefonkirinê.

miljöpartiet de gröna